

“ Mirov dikare romanên kurdî miqayesê romanên biyanî bike”

Romana kurdî heye û her diçe pêş dikeve, dewlemend dibe. Netenê bi zaravayê Soranî herweha bi zaravayê Kurmancî û Zazakî jî romana kurdî heye. Ez di derbarê rewşa romana kurdî ya bi zaravayê Soranî zêde tişt nizanim, lê belê bi kurmancî bi sedan romanên kurdî hene. Pêşî kurdên Kafkasyê û paşê jî kurdên ku li diaspora ewropayê bi taybetî jî yên li Swêdê- gelek berhemên kurdî afirandin.

Romannivîserên kurdên bakur, Mehmet Uzun, Laleş Qaso, Lokman Polat, Hesenê Metê, Firat Cewerî, Mustafa Aydogan, Bubê Eser, Î. Seydo Aydogan, Silêman Demîr, Mazhar Bozan, Mihemed Dehsiwar û hwd gelek romanên kurdî nivîsîn û hêj jî dinivîsin.

Aya romannivîserên kurd hene û bi kurdî roman dinivîsin? Min li jorê navên hinekan rêz kir. Di demên berê de romannivîserên kurd yên li Swêdê bi kurdî roman dinivîsandin, niha li welêt jî li bakurê Kurdistanê- romannivîserên kurd romanên kurdî dinivîsin.

Belê, mirov dikare romanên kurdî miqayesê romanên biyanî bike. Ma çiyê nivîskarên kurd ji nivîskarên biyanî kêmtir e û herweha çiyê romanên kurdî ji yên biyanî qelstir e. Haya min ji romanên biyanî heye û gelek romanên kurdî ji gelek romanên biyanî baştir û hêjatir in. Ji alî naverok, tevn, herikbarî û herweha ji alî pîvanên romanê ve ji yên biyaniyan çêtir in.

Luqman Polat

Hinek romanên Mehmed Uzun, Laleş Qaso, Lokman Polat, Hesenê Metê, Î. Seydo Aydogan û yd, ji gelek romanên biyanî çêtir in û asta wan bilind e. Ji ber bêdewletbûna kurdan, ji bo ku welatê kurdan hatibû parçekirin û li bakurê Kurdistanê zimanê kurdî hatibû qedexekirin, lewre romana kurdî direng derket holê û ji ber sedemên siyasî û aborî û herweha ji ber rewşa gelêrî û konjoktura Kurdistanê romana kurdî pir pêş neket. Lê, niha rewş guheriye û romana kurdî her diçe pêş dikeve, dewlemend dibe.

ROMAN